Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

RÜCK KEHR

# Zanyariyên derbarê vegera bi dilxwazî

KURMANDSCHI

## Çi dibe heke serlêdana we ya mafê panaberiyê bê redkirin?

Ligel **redkirina serlêdana we ya mafê panaberiyê**, ji we re **demek** tê diyarkirin, ku heta wê demê divê hûn vegerin welatê xwe. Ev dem normalî di navbera **hefteyekê heta 30 rojan de ye. Heke hûn di nava vê dema diyarkirî de venegerin welatê xwe, hûn dikarin bi zorê bo welatê we bên vegerandin** (paşveşandin). Wê demê divê hûn mesrefên paşveşandinê bi xwe bidin û gelek salan hûn nema dikarin bi fermî derbasî Elmanyayê, an jî welatekî din yê Yekîtiya Ewropayê bibin (qedexeya derbasbûnê). Bêyî belgeyên fermî yên mayînê, hûn nikarin li Elmanyayê bimînin: Wê demê divê hûn hertim di tirsa wê yekê de bin, ku hûn ji aliyê polîsan ve bên girtin û bo welatê we bên vegerandin. **Sûd ji mecala vegera bi dilxwazî wergirin, beriya ku gavên bidawîanîna bi zorê ya mayîna we destpêbikin.**

## Dewleta elman piştgiriya we dike, heke hûn bi dilxwazî vegerin welatê xwe

Bernameyên vegerê û destpêkeke nû bi gellek şêwazan alîkariyê dikin – bo mînak, heke pereyên we tune bin ku hûn bi xwe mesrefên xwe yên vegerê bidin. Ji bo hinek welatan rengên din yên alîkariyê ji bo vegera bi dilxwazî hene, ji bo ku destpêka nû li welatê wan kesan ji wan re bê asankirin. Alîkarîkirin wê mecalê dide we, ku hûn bi serê xwe vegera xwe pêkbînin û vegera xwe baş amade bikin.

## Hûn dikarin kîjan alîkariyan wergirin?

**Bernameya Vegerê** ji bo vegera bi dilxwazî alîkariya we ya rêkxistin û amadekirina vegerê, û herwiha alîkariya aborî jî dike.

- Dayîna mesrefên seferê
- Dayîna pereyekî mezin
- Dayîna mesrefên tendirustî




**Bernameyên cûrbecûr yên veguncînê** dikarin di destpêka jiyaneke nû de li welatê we ji we re bibin alîkar.

- Bernameyên perwerdeya pîşeyî
- Alîkarî di peydakirina kar de
- Alîkarî di avakirina karekî biçûk yê ticarî de
- Alîkarî di warê bicîhbûnê (maldîtin) de
- Şêwirmendî û alîkarî di mijarên civakî û tendirustî de

## Hûn dikarin li kû derê zanyariyên bêtir wergirin?

Li ser malpera agahdarkirinê ya derbarê vegera bi dilxwazî **www.ReturningfromGermany.de** hûn dikarin zanyariyên derbarê welatan, herwiha bernameyên derbarê vegerê û veguncînê de wergirin û bi rêya lêgerîna li ser malpera navenda şêwirmendiya vegerê ya herî nêzîkî xwe bibînin. Wekî din hûn dikarin pêwendiyê bi telefona vegerê ya BAMFê re deynin: **+49 911 943 - 0**



## Şêwirmendiya vegerê alîkariya we dike

Heke nêta we ya vegera bi dilxwazî bo welatê we hebe,
hûn dikarin hemû pirsên xwe ji şêwirmendiya vegerê bikin.

- Şêwirmendiya vegerê belaş, nihênî û xusûsî ye
- Şêwirmendiya vegerê di warê rêkxistin û amadekariyên vegerê, serlêdanên alîkariyên aborî, û heke pêwîst be, di serlêdana ji bo alîkariyên din de, alîkariya we dike.
- Heke nasnameyeke we ya fermî tune be, piştgiriya we di peydakirina nasnameyeke yedek jî tê kirin.
- Ji bo ku hûn di civîna ligel şêwirmendiya vegerê de her tiştî fêm bikim, wê wergêrek jî tevlî civînê bê kirin. Lê hûn dikarin bi xwe jî kesekeî bi xwe re bînin şêwirmendiya vegerê, ji bo ku ew ji bo we wergerîne.

## Vegera bi dilxwazî her demê mimkin e?

Vegera bi dilxwazî ji bo wan kesên ku serlêdana mafê penaberiyê kirine û hêj doza wan ya penaberiyê bi dawî nehatiye, herwiha ji bo kesên ku mafê mayîna li Elmanyayê wergirtine jî, mecal û asoyên nû ji wan re li welatê wan vedike.

**Hîn di dema ku biryar li ser serlêdana we ya mafê penaberiyê nehatî dayîn jî, hûn dikarin bi şêwirmendiya vegerê re bikevin pêwendiyê. Ev yek tu bandorê li biryara li ser serlêdana mafê penaberiyê nake.**



### Nêta we ya vegera bi dilxwazî heye? Jivanekî ligel navenda şêwirmendiya vegerê ya herî nêzîkî xwe çêkin:

Di vegera bi dilxwazî de, mafekî qanûnî yê alîkariyê tune. Alîkarî ji bo her kesekî tenê careke dikare bê kirin. Heke kesekî vegeriyayî welatê xwe dîsa vegerê Elmanyayê, an jî heke kesek venegerê welatê xwe, ew alîkariya ku hatî dayîn, dikarin dîsa jê bistînin.